Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :958 20 -Nîsan- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# FERAT-DER li hemberî bişaftinê têdikoşe

**Ji Rêveberiya komeleyê Yeşîm Akgul got, em xebata xwe ya ji bo ziman berfirehtir bikin û bi hev re zimanê dayîkê ji tehlûkeya nemanê biparêzin.**

Komeleya FERAT-DER'ê ya ku li Semsûrê xebatên Zimanê Kurdî bi rê ve dibe, bi armanca li dijî bişaftinê bi taybetî ji bo ku ciwanan ji pêla bişaftinê rizgar bike hatiye avakirin. Ji Rêveberiya komeleyê Yeşîm Akgul got, ew ê xebatên xwe yên ji bo ziman berfirehtir bikin û bi hev re zimanê dayikê ji tehlûkeya nemanê biparêzin.

**Pêşî li polîtîkayên bişaftinê digirin**

Yeşîmê di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku divê Kurd ji bo zimanê xwe bixebitin û zimanê xwe bigihîn hemû deveran.
Yeşîmê wiha berdewam kir: "Komeleya me ji bo ku zarokên Kurd bi çanda xwe mezin bibin û ciwanên Kurd bikaribin çanda xwe bijîn hate avakirin. Di komeleyê de bi du zaravayên Kurdî yên Kurmancî û Kirmanckî ders tên dayîn. Piştî kongreya komeleyê ku ez jî ji bo kar û xebatên li ser ziman hatim pêşniyarkirin, ji bo ku hem zimanê xwe pêşve bibim hem jî parastina ziman û çanda Kurdî bikim min dest bi xebatê kir. Li bajarê Semsûrê polîtîkayên bişaftinê di lûtkeyek mezin de ye û gelê Kurd ji zim an û çanda xwe dûr dikevin. Ew polîtîka herî zede jî li ser ciwanan heye û êdî demek piştre otoasîmîlasyonek dikeve dewrê. Me jî xwest pêşiya vê polîtîkayê bigirin."

**'Divê elaqe zêdetir bibe'**

Yeşîm, diyar kir ku ew di hêla ziman de armanc dikin ku xebatên xwe berfirehtir bikin û derbarê xebatên komeleyê de wiha axivî: "Di çarçoveya xebatên komeleyê de em panel û cûrbecûr bernameyan li dar dixin. Pergala modernîteya kapîtalîst em ji zimanê me dûr xistine û wekî polîtîkayeke qirkirinê derdikeve pêşberî me. Lê têkoşîna me li dijî wê berdewam dike û em xebatên xwe li ser wî esasî didin meşandin. Dersên me dest pê kirin e. Rojên yekşemê ders tên dayîn. Bal û elaqe ji bo komeleyê heye lê divê ev elaqe zêdetir bibe. Divê li her bajarekî herêmê xebatên di hêla parastina zimanê dayikê de hebin ku nifşê nû bikaribe berdewamiya zimanê me bigihînin siberojê."

**'Malbat nema zarokan fêrî ziman dikin'**

Yeşîm, di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku ji bo zimanê Kurdî bibe zimanê fermî û perwerdehiyê zêdetir iserar divê û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Mixabin êdî hinek malbat jî nema zimanê xwe hînî zarokên xwe dikin. Zarok jî ji derdora xwe bi bandor dibin. Her wiha ji ber ku li dibistanan zimanê tirkî zimanekê perwerdehiyê ye û zimanê kurdî ne zimanê fermî û perwerdehiyê ye, zarokên kurd ji zimanê xwe dûr dikevin. Lê zarok herî zede bi zimanê xwe yê zikmakî dikarin xwe îfade bikin û hayê me ji polîtîkayên qirkirina zimanê Kurdî heye. Em dixwazin li Semsûrê pêşiya van polîtîkayên qirkirina ziman bigirin û em ji bo vê li vir in. Em li benda şagirtên xwe ne. Divê emm xwedî li zimanê xwe derkevin. Bazara xwe bi zimanê xwe bikin, bi zimanê xwe bijîn û bi hevre zimanê xwe rizgar bikin. Zimanê dayikê pîroz e."

***JINNEWS***




# Li qûntara Çiyayê Cûdî Cejna Paskalya

**Bawermendên xiristiyan, li navçeya Silopiyayê li qûntarê Çiyayê Cûdî Cejna Paskalyayê pîroz kirin.**

Li gundê Hesena yê Silopiya ya Şirnexê ku gundê suryanan e, gelek bawermendên xiristiyan bi munasebeta Cejna Paskalyayê hatin ba hev û cejna xwe pîroz kirin.

Ji bo cejnê, ji şevê din heta niha li gund amadekarî dihatin kirin û bi sedan welatiyan hêkên reng bi reng boyax kirin. Gelek filehên ji gundên derdorê jî li gundê Hesenayê hatin ba hev.

Welatiyan, kesên li malan digeriyan hêk, falik û fêkî belav kirin.
Di dema lîstika hevxistina hêkan de dîmenên rengîn derketin holê. Piştre jî xwarinên hatibûn çêkirin li nava gund pêşkeşî welatiyan hate kirin.

***MA***



## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Damezirandin | Avakirin, sazkirin: Salvegera damezirandina Komara Kurdistanê. |
| Dameziriner | Kesê ava kirî: Dameziriînerê komarê li meclisê sond xwar. |
| Diyarker | 1. Kesê ku tiştekî dide zanîn. Xuyaker, ronker, zelalker, ragihîner. 2. Kesê yan tişta bingehî. |
| Hevrê | Kesên ku hizir û baweriya wan weke hev. Bi taybetî di siyasetê de. |
| Mayînde | Tişta ku demdirêj dimîne. Xurt, qayîm. |
| Pejirandin | Qebûlkirin. Pejirand, ango qebûl kir. |
| Rêxistin | Komek mirovên ji bo heman armancê bi hev re dixebitin. Organîzasyon, sazûman, teşkilat, kom, partî, hizb: |
| Senato (Îtalî) | Li hin welatan li gorî temen û perwerdeya endamên parlamentoyê, meclisa hatî avakirin. Ciyê ku senator lê kom dibin. |
| Senator (Îtalî) | Endamê senatoyê. |
| Tengav | 1. Ciyê teng yê av tê re derbas dibe. 2. Kesê ji bo tiştekî ketî tengiyê: Ez ji bêpereti tengav bûme. 3. Kesê destava wî ya piçûk tê. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | N | ■ | Ş | A | M | ■ | | ■ | S |
| 2 | A | M | Û | R | ■ | S | ■ | A | Ê |
| 3 | M | Û | ■ | Î | N | S | A | N | ■ |
| 4 | E | S | A | ■ | Û | ■ | W | A | N |
| 5 | ■ | A | L | A | ■ | P | A | T | A |
| 6 | T | ■ | Ê | ■ | A | E | ■ | O | ■ |
| 7 | E | J | N | Û | ■ | R | O | M | A |
| 8 | ■ | A | C | ■ | H | E | D | Î | S |
| 9 | I | R | ■ | N | O | ■ | E | ■ | A |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 2 | ■ | | | ■ | | | | | ■ |
| 3 | | | | | | ■ | | | |
| 4 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 5 | ■ | | | | | | ■ | | |
| 6 | | ■ | | | ■ | | | ■ | |
| 7 | | | | ■ | | | ■ | | ■ |
| 8 | ■ | | | | ■ | | | | |
| 9 | | | ■ | | | ■ | | | |

**ÇEP-RAST**

1. Yezdanekî misrî... Dinya, cîhan
2. Cînava pirsiyariyê ya ku tê wateya; li kû ye?... Xwarinên ji şîr
3. Navçeyeke Agirî... Îrade
4. Bi soranî 'av'... Rehibê Budayan
5. Her tiştê têkildarî debara jiyanê... Rêxistina polîsan a naziyan
6. Rojek... Pirsek di rewşa ne tewandî de
7. Kevir... Nexweşiyek
8. Ajala xwedîtêjik... Goştê ku diran tê de çikandî
9. Plakaya navneteweyî ya Tirkiyeyê... Li Colemêrgê gotina 'yek'ê... Dijberê rengê spî

**JOR-JÊR**

1. Tevgera hewayê... Kurtebêja Antîmonê
2. Lehengê destana Newrozê... Temen
3. Sir, tiştê her kes pê nizane... Vexwarineke bi alkol
4. Mehek... Pirsek di rewşa tewandî de
5. Mehek
6. Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tinekirin... Sindoqa ku pê qûm û tiştê wisa tê pîvan
7. Dua, niyaz... Plakaya navneteweyî ya Îranê
8. Cephe, bere... Beşeke malê, jûr
9. Cureyekî zad ku piranî şorbe pê tê çêkirin... Kar û xebat

# Navenda ragihandina HPG'ê: 28 dagîrker hatin cezakirin, 2 helîkopter hatin derbkirin!

Dewleta tirkî ya dagîrker bi piştgiriya PDK'ê li herêma Avaşin û Zapê ji bejahî û hawa ve dest bi êrişên dagîrkeriyê kir. Di daxuyaniya HPG'ê de hat zanin ku ji aliyê gerîlayên azadiyê ve 28 dagîrker hatine cezakirin, 9 dagîrker birîndar bûne û 2 helîkopterên êrişê hatîne derbkirin. R-5



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 958 20-Nîsan- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Armanca êrişên dagîrkeriyê qirkirina azadîxwazan e

Roşîn Mûsa diyar kir ku armanca dagîrkeriyê qirkirina gelê azadixwaz e û got, divê em hêza civakê bikin bingeh û li ser bingehê çanda gelê berxwedêr li ber xwe bidin. Lewra ti hêzên navdewletî wê gel neparêzin. R-4



# ANCAMA HEVDÎTINÊN PDK'Ê BI DEWLETA TIRKÎ RE

## ÊRIŞÊN DIJWAR YÊN DAGÎRKERIYÊ LI SER XAKA BAŞURÊ KURDISTANÊ

**PDK`ê hêzeke mezin şand Kurêjaro R-2**



## TJK-E: Ev êriş ji bo destketiyên gelê Kurd û sekna azadiyê ya jinên Kurd gefeke mezin e

Êvara 17 mehê artêşa dewleta tirkî ya dagîrker bi dijwarî êrişê herêma Zapê û Kurêjaro kir. PDK'ê jî hêzeke mezin ya leşkerî şand bajarokê Şêladizê û Dêrelokê ku li biniya çiyayê Kurêjaro ne. R-2

## 'Dorpêçkirina rejimê ya taxên Helebê encama hişmendiya wê ya desthilatdar e'

*Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk Xerîb Hiso da zanîn ku, armanca sereke ya dorpêçkirina taxa Şêx Meqsûd û Eşrefiyê ji aliyê hikûmeta Şamê ve, şerê li dijî îradeya gelê Kurd e. Herwiha got, ev ne tişteke nû ye, ji berê ve rejimê gelek caran bûye sedema aloziyê. R-4*

## Hemleya paqijiyê ya TEV-DEM`ê li Qamişlo berdewam e

Hemleya paqijiyê ya TEV-DEM`ê ku 28`ê Adarê dest pê kiriye, li Qamişlo berdewam e.
***R-6***



## PDK'ê xwe derewîn derxist û daxuyaniya xwe ya dijî KCK'ê jê bir

Dema KCK'ê bi daxuyaniyekê ragihandibû ku wê dewleta Tirk bi hevkariya PDK'ê di 15'ê Nîsanê de êrişî Başûrê Kurdistanê bike, PDK'ê jî bi daxuyaniyekê ragihand ku wê 15'ê Nîsanê jî were û tiştek wisan çênabe. Lê êriş di 15'ê Nîsanê de destpê kir, PDK'ê jî daxuyaniya xwe li ser beşa medyaya xwe ya Soranî jê bir. R-2

## Ambargoya li ser' Şêxmeqsûd û Eşrefiyê piştgiriya planên 'dawleta tirkî ye

***Mistefa Hemo da zanîn ku ambargoya li ser taxa Şêxmeqsûd-Eşrefiyê plana rejima Surî ya bi dewleta tirkî re ye. Herwiha da xuyakirin ku armanca vê ambargoyê projeya têkbirina jiyana hevbeş û piştgiriya dagîrkeriya dewleta tirkî ye. R-5***

## Di şevên Remezanê de lîstikên kurdewarî R-6

**Bi ronîkirina tarîtiyê wê tekoşîna azadiyê bi ser bikeve** *R-3*
Eylem Şoreş/rojnamevan

**Dewleta dagîrker li Amedê 66 kes girtin**

Dewleta Tirkan ya dagîrker, li dijî Kurdan qirkirina siyasî li Amedê da destpêkirin û 66 kes destgîr kirin. R-2

## "Li herêmên dagîrkirî kiryarên herî qirêj li ser jinan tên kirin"

Endama Komîteya Penaberên Serêkaniyê, Zehra Semo da zanîn ku jinên li herêmên ji aliyê dewleta Tirkan û çeteyên wê ve hatîn dagîrkirin dimînin, rastî her cure tundî, heqaret, revandin û kuştinê tên. R-2



## Firat Can: Min bi nivîsên xwe dîwarên zindanê hilweşandin



Firat Can diyar kir ji bo tiştên di kûrayiya dîroka mirovên di nava têkoşîna Kurdan de winda nebin di girtîgehê de dest bi nivîsê kiriye û got, min bi nivîsên xwe dîwarên zindanê hilweşandin. R-7

**Divê PDK mesafeyê bixe navbera xwe û faşîzma tirkî**
Zekî BEDRAN
*R-5*

**Mentalîte**
Sîpan Şînda
*R-7*



**PDK ji şerê bi PKK`ê re ditirse!**
Dilyar Cizîrî
*R-4*



# PDK`ê hêzeke mezin şand Kurêjaro

Êvara 17 mehê artêşa dewleta tirkî ya dagîrker bi dijwarî êrişê herêma Zapê û Kurêjaro kir. PDK'ê jî hêzeke mezin ya leşkerî şand bajarokê Şêladizê û Dêrelokê ku li biniya çiyayê Kurêjaro ne.

**Navenda Nûçeyan**

Sedema danûstandinên rojên dawî yên navbera rayedarên PDK'ê û dewleta Tirk eşkere bû. Li gorî daxuyaniya HPG'ê ji êvara 17'ê Nîsanê û pê ve bi taybetî li xeta Başûr êriş zêde bûn. Bi hevkariya PDK-Dewleta Tirk planeke nû ya qirêj xiste.

Li gorî agahiyên di nûçeyên ajansa ANF'ê jî hatîn destgirtin, hêzên PDK'ê ber bi bajarokên Şêladizê û Dêrelokê ve hêzeke mezin şandine. Li bejahiya vê herêmê li çiyayê Kurêjaro di navbera gerîlayên HPG û artêşa Tirk de şerekî giran diqewime.

Heman çavkaniyan ragihandin ku PDK hîn jî hêzên xwe yên leşkerî dişîne herêmên gerîla û panên êrişeke berfireh heye. Hejayê bîraninêye ku ji aliyê pir saziyên civakî ve bangawaziya gel hat kirin ku li hember van êrişên toyekûn rabin ser piya.



## PDK'ê xwe derewîn derxist û daxuyaniya xwe ya dijî KCK'ê jê bir

**Dema KCK'ê bi daxuyaniyekê ragihandibû ku wê dewleta Tirk bi hevkariya PDK'ê di 15'ê Nîsanê de êrişî Başûrê Kurdistanê bike, PDK'ê jî bi daxuyaniyekê ragihand ku wê 15'ê Nîsanê jî were û tiştek wisan çênabe. Lê êriş di 15'ê Nîsanê de destpê kir, PDK'ê jî daxuyaniya xwe li ser beşa medyaya xwe ya Soranî jê bir.**

Komîteya Têkiliyên Derve ya KCK'ê di 26'ê Adarê de bi daxuyaniyekê ragihand ku dewleta Tirk a dagirker wê bi hevkariya PDK'ê 15 Nîsan êrişek li ser Başûrê Kurdistanê bide destpêkirin. KCK'ê di daxuyaniya xwe de ev bang kiribû; "Em bang li Parlementoya Başûrê Kurdistanê, partiyên siyasî, saziyên sivîl ên civakî, saziyên fermî û raya giştî dikin ku li hemberî plana dagirker rabin û PDK'ê hişyar bikin."

Piştî ku KCK'ê ragihand ku wê dewleta Tirk bi hevkariya PDK'ê êrişî Başûrê Kurdistanê bike, di 29'ê Adara 2022'an de PDK'ê daxuyaniyek belavkir.

**Daxuyaniya PDK'ê**

PDK'ê ku li ser hemû saziyên xwe daxuyanî belavkir, got; "KCK dixwaze bi vê daxuyaniya xwe ne aramî û tevlîheviyê di nava raya giştî de belav bike. Ji bo 15'ê Nîsanê gelek roj nemane, emê wê demê jî direw û nerastiya we ji bo xelkê Kurdistanê zelal bikin. Wê carek din dûbare rûyê we yê rast ji bo gel derbikeve."

KCK'ê çi got pêkhat


KCK ku roja 15'ê Nîsanê diyarkiribû, di 15'ê Nîsanê de serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî yekser çû Tirkiyeyê û bi serokkomarê Tirkiyeyê Recep re civiya.

Êriş destpê kir

Piştî Barzanî bi Erdogan re civiya, Herêmên Parastina Medyayê ji aliyê balafirên dewleta Tirk a dagirker ve bi dijwarî hatin bombebaran kirin. Êriş tam di 15'ê Nîsanê de bi bombebarana balafiran destpê kiribû.

Lê duh bi şev êrişa ji bo dagirkirina Başûrê Kurdistanê ji aliyê rayedarên Tirkiyeyê ve bi fermî hate ragihandin. Belê PDK'ê gotibû wê 15'ê Nîsanê jî were û ewê bibînin, derew wê derbikevin. 15'ê Nîsanê hat û êrişa ji bo dagirkirina Başûrê Kurdistanê duh bi şev bi fermî destpê kir. PDK ku di 29'ê Adarê de daxuyanî belavkiribû, duh bi şev daxuyaniya xwe li ser hemû beşa Soranî ya medya xwe sîl kir.

***ROJNEWS***




## Dewleta dagîrker li Amedê 66 kes girtin

**Dewleta Tirkan ya dagîrker, li dijî Kurdan qirkirina siyasî li Amedê da destpêkirin û 66 kes destgîr kirin.**

Li gorî agahiyên ji ajansa Mezopotemya, li Amedê dewleta Tirk a dagirker di operasyonên qirkirina siyasî de herî kêm 66 kes girtin. Di nava wan de rojnamevan jî hene.

Di çarçoveya lêpirsîneke serdozgeriya dagirker li Amedê de serê sibeha 15´ê Nîsanê destpê operessyona qirkirinê hati ye kirin.



Li gorî heman çavkaniyê, lêpirsînê bi hinceta Newrozê hatiye kirin, ji bo 105 kesan biryara girtinê hatiye dayîn. Ji van 105 kesan, hêzên dagirkeriya dewleta Tirk 66 kesan xistin nezaretê.

Xwediyê Îmtiyazê yê rojnameya Xwebûn Kadrî Esen û rojnamevan Alî Koçer jî di nava kesên girtî de ne.

**Ji 66 kesên di nezaretê de navê**

57 kesên hat zanîn:

"Abdûlvasih Çelik, Arzû Orûç, Bahar Avci, Bunyamin Yilmaz, Cihat Turkekûl, Davût Kûrt, Delal Aslan, Deniz Aksin, Dilara Donmuş, Dogan Tarhan, Ethem Tokak, Farûk Azarkan, Ferhat Diri, Haliya Çelikkiliç, Hamza Aktaş, Hasan Çelik, Huseyin Çapli, Îbrahim Polat, Înanç Mûtlû, Kadri Esen, Kemal Guzel, Kerem Uçak, Kûdret Varli, Leyla Çakil, Leyla Ersoz, Leyla Varli, Mehmet Ali Yuce, Mehmet Çadirci, Mehmet Ekinci, Mehmet Kiliç, Mehmet Şaban Karakaş, Mehmet Şah Pinar, Mehmet Yilmaz, Mir Ali Koçer, Mehmet Fûrkan Çankara, Mûrat Çetin, Mûrat Kiliç, Mûstafa Adanir, Naşide Polat, Nûjiyan Baysal, Orhan Ekin, Ramazan Îz, Ramazan Ozgezici, Rozalin Acar, Serdal Karataş, Serhad Şan, Sevim Kahramaner, Suleyman Can, Şahin Guzel, Şivan Ayazgul, Yakûp Serhat, Yildiz Okta,Ulaş Yarar, Yilmaz Yavûz, Yûnûs Yûnca."

Hêjayî bîraninê ye ku, hêzên dewleta Tirk 12'ê Nîsanê jî di bin navê "Lêpirsîna Kobanê" de li 13 bajaran avêtibûn ser mal û avahiyên endamên HDP'ê û bi dehan kes kiribûn nezaretê. Avahiya HDP'ê ya navçeya Cizîrê jî ji aliyê polîsan ve hatibû wêrankirin.

***Çavkanî: MA***

## TJK-E: Ev êriş ji bo destketiyên gelê Kurd û sekna azadiyê ya jinên Kurd gefeke mezin e

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**TJK-E li hemberî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker ku li herêma parastina medya dest pê kirine, bi daxuyaniyekê banga lezgîn li Kurdên li Ewropa, jinên Kurd, hêzên şoreşger û demokratîk, hêzên femînîst kir ku dakevin qadan, li îradeya azad xwedî derkevin û Kurdistanê biparêzin.**

Tevgera Jinên Kurd ya li Ewropa (TJK-E) bi daxuyaniyeke nivîskî nerazîbûn nîşanî êrişên dagîrkeriyê da û banga daketina qadan kir.

Daxuyanî wiha ye:

"Dewleta Tirk a faşîst li ser qadên Zap û Kurêjahro yên Herêmên Parastinê yên Medyayê dest bi êrişeke nû ya dagirkeriyê kiriye. Beriya her tiştî em dixwazin gotina dawî bêjin ku ti êriş wê li hemberî îradeya gelê Kurd nikaribe bi ser bikeve; îdîaya azadiyê wê bê parastin, meşa azadiyê wê nikaribe bê rawestandin û êriş wê bêne têkbirin.

**Sedema danûstandinan diyar bû**

Li gorî daxuyaniya HPG'ê ji êvara 18'ê Nîsanê û pê ve bi taybetî li xeta Başûr êriş zêde bûn. Ev rewş jî nîşan dide ku bi hevkariya PDK-Dewleta Tirk planeke nû ya qirêj ketiye meriyetê ku berê di çapemeniyê de işaret pê hatibû kirin. Sedema danûstandinên rojên dawî yên navbera rayedarên PDK'ê û dewleta Tirk eşkere bû.

Sibata derbasbûyî dewleta Tirk li heman xetê êrişî Garê kiribû, lê belê




mîna êrişên beriya wê ew êriş jî têk çûbû. Gerîla li Garê, Werxelê, Mamreşo, Zendûra û Girê Sor bi berxwedaneke bêhempa, berdêlên giran da be jî, bersiv da yên ku dixwazin îradeya gelê Kurd bişikînin.

Operasyonên li derveyî sînor ên di salên 1990'î de, têkçûna li Zapê ya sala 2008'an û herî dawî jî êrişên di salên 2020-2021'ê de hatin kirin çawa ku dewleta Tirk a faşîst têk çû, vê carê jî bi armanca tunekirin û tasfiyeyê, tevî PDK'ê dest bi êrişê kir. Ev êriş ji bo destketiyên gelê Kurd, ji bo sekna azadiyê ya jinên Kurd gefeke mezin e.

**Bi berxwedaneke topyekûn dikare bê têkbirin**

Eger li hemberî van êrişan seknekê topyekûn bê nîşandan û xwedî li berxwedana gerîla bê derketin, çawa ku dewleta Tirk berê têk çû wê careke din têk biçe û ji bo dewleta Tirk bibe destpêka bidawîbûnê. Newroza Rêbertî ya sala 50'emîn û qadên 8'ê Adarê nîşanî dost û dijmin her kesî da ku ev îradeya azadiyê bi êrişan naşikê. Ev îrade xwedî wê hêzê ye ku êrişan hemûyan têk bibe. Bi vê bîr û baweriyê em bang li gelê Kurd ê li Ewropayê, jinên Kurd, hêzên demokratîk û şoreşger, hêzên femînîst dikin ku dakevin qadan, xwedî li îradeya azadiyê derkevin û Kurdistanê biparêzin."



# Firat Can: Min bi nivîsên xwe dîwarên zindanê hilweşandin

Firat Can diyar kir ji bo tiştên di kûrayiya dîroka mirovên di nava têkoşîna Kurdan de winda nebin di girtîgehê de dest bi nivîsê kiriye û got, min bi nivîsên xwe dîwarên zindanê hilweşandin.

Bi hezaran girtiyên di girtîgehên Tirkan de di şertên normal de ji dêvila ku werin berdan ji ber ku lêferzkirina poşmaniyê red kirine, dîl tên girtin. Nivîskar Firat Can ê ku cezayê wî qediyabû ji ber vî tiştî 7 mehan zêdetir di girtîgehê de ma.

Can piştî hat berdan jî xebatên xwe yên wêjeyî didomîne. Can ji ANF'ê re qala girtîgeh, ruhê berxwedanê û xebatên xwe yên wêjeyê kir.

Can diyar kir di sala 2011'an de li Sûriyeyê ji ber xebatên ziman û nasnameya Kurdî ew ji aliyê rejîma BAAS'ê hate girtin û piştî çend mehan teslîmî dewleta Tirk hate kirin. Can got "Li Sûriyeyê di wî sê mehî de tiştên xerab hatin serê min. Li Şamê li cihekî bi navê Feyha ya ku di warê fermî de nayê qebûlkirin, mam. Li hemberî şoreşger û mûxalifan




êşkencexaneyek hatibû avakirin. Mayîna di wî cihê teng de, bi tena serê xwe êşkence bû. Piştre di çarçoveya Protokola Edeneyê ya di navbera Tirkiye û rejîma Sûriyeyê de teslîmî Tirkiyeyê hatim kirin."

Can diyar kir divê mirov karibin girtîgehê bikin navenda hilberînê û got "Ji bo me şoreşgeran girtîgeh ne cihekî wisa ye ku mirov dikeve wê derê. Ji bo kesên li hemberî vê pergalê dixwazin tiştekî bikin, ev der rawestgehek e. Divê neyê jibîrkirin girtîgeh jî cihekî berxwedanê ne. Ji bo girtîgeh ne cihê razanê lê cihên hilberînê ne. Girtîgeh mekanekî teng e û hûn di nava çar dîwaran de ne. Lê her tişt bi hiş ve girêdayî ye. Bi lêhûrbûnên fikrî hûn dikarin vî dîwarî hilweşînin. Li hewşê mirov dikare asîmanan bibîne lê kesên bi aramî lê hûr nebûne, dikarin wî asîmanî jî ji xwe re bigirin. Di warê fizîkî de ez hatibim girtin jî, min hewl da di warê fikrî û ruhî de ez li derve bim. Ez bawer im bi ser ketime."

**EZ GOTINA WÊJEYA ZINDANÊ QEBÛL NAKIM!**

Can diyar kir divê li girtîgehan jî wêje di cihekî girîng de be û got "Min bawerî pê anî ku divê heqîqet parçe nebe. Divê mirov parçe ji ya giştî qut neke. Ji bo min wêje wêje ye. Zindan an jî mekanekî din ê vî tiştî tune. Ji ber ku wêjeya li zindan di warê mekan de di zindanê de tê nivîsandin derdikeve holê. Lê ji bo min ne rastiyên mekanî lê tişta tê kirin girîng e. Ez naxwazim ji ber ku min berhemên xwe di zindanê de nivîsandine, berhemên min wekî wêjeya zindanê têkeve kategoriyê. Li gorî min ne rast e ku ev hilberîn wekî wêjeya zindanê were kategorîzekirin."

***ANF***

# Dirî li min bûbûn dijmin

**Diya min ez hişyar kirim, bûbû sibeh. Hê jî bêhna min giran bû. Li ser taştê berê min çû ser nûçeyan, du girtiyan li Sîlîvriyê li ber êşkenceyê hew xwe girtibû û jiyana xwe ji dest dabûn. Diriyan bêhn li wan çikandibû!**

Bi diltengiyekê di xew ve çûm. Ne ku di xew ve çûm, ne şiyar bûm ne jî di xewê de bûm. Xewn li min herimîn. Xewnereşkan bela xwe ji min venedikir. Hê jî bawer nakim ku dirêjiya xewnekê bi qasî sê saniyeyan e. Bila zanist careke din jî li ser mijara xewnan lêkolînan bike. Êş û aciziyên ku heta şeveqê di xewnên min de dibin çîrokên dengbêjan, ne sê saniye ne. Qebûl nakim!

Xewê zora min bir, deriyên xewnan li min vebûn. Li deştekê her dibeziyam, ne serî hebû ne jî binî. Min rêyek dabû ber xwe. Di wê baweriyê de bûm ku ew rê wê min bigihîne malê. Xeyalên malê dilê min germ dikirin û her dibeziyam. Li nîvê deştê diriyek di lingê min re çû. Hinekî rawestiyam, min dirî ji nav tiliyên xwe derxist û dilopek xwîn herikî ser axê.

Min dîsa dest bi meşê kir. Geh dibeziyam geh dimeşiyam. Min li pişt xwe nihêrî li cihê ku dilopa xwînê rijiyayî, şitleke diriyan bilind bûbû. Tirsiyam… ji xwîna xwe, hêza xwe û ji êşa diriyan. Ji aliyekî ve kêfxweş bûm ku xwîn tiştekî ewqasî bi hêz e, ji aliyê din ve jî ji diriyên ku şîn dibin jî ditirsiyam. Di nav fikaran de min dîsa li pişt xwe nihêrî, diriyeke din jî şîn bûbû. Sawa di dilê min de zêdetir bû. Min ji xwe re got, ev ne îşê dilopek xwînê ye. Dirî di kemînê de bûn. Li benda hatine min bûn. Dirî li min bûbûn dijmin. Dirî nebûn dijmin, jixwe dijmin bûn, xwe ji ber min vedişartin. Tirsiyam… Min lez da xwe…

Baweriya gihîştina malê hêz dida lingên min, dibeziyam. Tirsa şevê diket dilê min. Heke heta êvarî negihim malê wê dirî xefkeke din jî li ber min deynin. Min lezand. Di nav xwîdanê de mabûm. Tîrêjên rojê dibûn xwîdan û ji nav serê min ber bi bedena min ve diherikîn. Xem nedikir, hew mabû bigihim malê. Min li aliyê xwe yê rastê nihêrî diriyeke dirêj, dirêj, dirêj ku digihîşt ezmanan. Serê diriyê ezman qûl kiribû. Ji bilindiya wê hinekî tirsiyam lê xem nedikir, ez ê bigihîştama malê. Jixwe ne li ser rêya min bû, li kêlekê bû. Beziyam, beziyam, beziyam…

Diriyek di destê min ê çepê re çû. Li pêşiya min diriyek hebû û min nedîtibû. Xem nedikir, dibeziyam. Hem dibeziyam hem jî min hewl dida diriyê ji nav çermê xwe derxim.

Piştî ku tîrêjên tûj ên rojê ji ser min çûn, bayekî hênik bi ser min




de hat û bêhna min hinekî hate ber min, min dît ku li pêşiya min hin diriyên din jî hene. Divê li min nebûya şev! Dibeziyam…

Her ku diçû dirî zêdetir dibûn, yan jî zêde bûn lê min ji nû ve didîtin. Ji ber vê yekê min nedikarî bi qasî kêliya din bi lez bibezim. Di her gavekê de min hewl dida xwe ji diriyên li ser rê jî bidim aliyekî.

Hê jî rêya min hebû, dirî dirêj dibûn, zêde dibûn, derdora min dorpêç dikirin. Êdî têra xwe giran bûbû meşa min û rêya min xuya nedikir. Lê min dizanibû li aliyê rast im. Di her qevzekê de diriyek di laşê min re diçû, dîsa jî ne xema min bû. Diçûm, diçûm û diçûm. Zêde dibûn, diçûm, zêde dibûn, diçûm, bilind dibûn. Wan dor li min digirt…

Rengê ezmanan vediguherî rengekî zer, pirteqalî û sor. Dengê diriyan dihat, li hev diketin, dengekî wekî qêrînekê ji wan bilind dibû. Di ber guhê min de difîkandin… êdî ji ber ku nêzîkî min bûbûn, min dijminên xwe bi çavên serê xwe didîtin, ji wan neditirsiyam, lê cihên ku dirî di wan re çûbûn dişewitîn. Xwîdana min bi ser wan deran de diherikî û bêhtir dişewitîn. Dirî dirêj dibûn, ber bi ezmanan ve diçûn. Dûr ji wî halî, ev min nefetisînin heta êvarî? Neditirsiyam. Lê dibe ku xwe li min bipêçin û min bifetisînin.

Yekê ji wan xwe li lingê min pêça, şev di rê de bû, va ye dihat… Diriyê xwe li min dipêça, şev dihat, diriyê xwe li noqa min pêça, şev dihat, diriyê xwe li destê min pêça, şev dihat, diriyê xwe qirika min pêça, şev dihat, bêhna min bi qasî meşa kosiyekî giran diçû û dihat, diriyê xwe dipêça, şev dihat, bêhna min ne diçû ne jî dihat… Bi tenê bûm, min dixwest gazî diya xwe bikim, diriyan nedihişt deng ji min derkeve. Gaziya min dibû hêvî, dibû girî û diherikî…

Diya min ez hişyar kirim, bûbû sibeh. Hê jî bêhna min giran bû. Li ser taştê berê min çû ser nûçeyan, du girtiyan li Sîlîvriyê li ber êşkenceyê hew xwe girtibû û herduyan jiyana xwe ji dest dabû. Diriyan bêhn li wan çikandibû, bi tenê mabûn, kesî dengê wan nebihîstibû, dawî dawî dawî dawî li jiyana wan anîbû..!

***Ozgûr Polîtîka- HÊZIL BOTAN***



## Mentalîte

Sîpan Şinda

Di pergala mêtîngeriyê de her tim armancek heye, tinekirina neteweyên bindest û têkbirina hişmendiya takekesî û ya civakî. Ev mentalîteya mêtîngeran e û ew li gorî demê vê mentalîteyê nû dikin û guhertinan têxinê. Bingehê mentalîteya mêtîngeran ya li himberî bindestan ti caran nayê guhertin. Her çend li gorî desthilatdaran carna hinek rêbazên cuda tên bikarînin jî, lê belê di esasê xwe de armanc her ji holêrakirin û têkbirina bindestan e. Herweha li gorî demê jî, rêbazên xwe diguherînin û nûjen dikin.

Ev sed sal in mentalîteya komara tirkî ya li himberî Kurdan ev e. Bi pirranî rêbazên hişk û bi awayekî fîzîkî jiholêrakirin hatiye bikaranîn. Lê belê armanca mentalîteya pergalê her ew e ku netewa Kurd ji fîzîkî pirtir di warê giyanî û mejî de têkbirin e. Ji ber wê desthilatdariya îro bi awayekî gelekî pisporî û hovane êrîşî gelê Kurd dike. Ji aliyekî ve propagandaya "biratiya" derew dike, ji aliyê din ve ji êrîşî mejî, giyan, exlaq, hişmendî û nirxên netewa Kurd dike. Çi li girtîgehan, çi li meclîsê, çi li kolanan, çi li saziyên fermî, çi di medyayê de ev yek bi awayekî eşkere tê kirin. Her roj polîs û leşker bi seyareyên xwe didin ser zarokên Kurdan û wan dikujin. Evê jî weke qeza didin xuyakirin û dibêjin 'mane her zarokên Kurdan in, hingî yek jê kêm bibe baş e' û bixwe ji xwe re raporan girê didin û destên xwe dihejînin û diçin. Lê ev ne nêzîkbûneke ji rêzê ye û mirov nikare bêje ev derveyî mentalîteya pergalê û nêzîkbûna desthilatdariyê tê kirin. Ev temamî girêdayî wê ye. Mînak girtîgehên Tirkiyê bûne cihê ku civak tê trawmatîzekirin e. Her roj zarokên Kurdan di wan zîndanan de tên işkencekirin û termê wan derdikevin. Bi sedan kesên ku nexweşên giran in û nexweşiyên bê derman bi wan re heyîne xistine wan zîndanan û bi vî awayî civakê trawmatîze dikin. Berî çend rojan du xortên Kurd di girtîgehê de bi işkenceyê hatin kuştin. Pergalê weke her demê derewek ji kuştina wan re jî peyda kir. Lê ji wê bibore, derheqê kesên ku di medya dijîtal de behsa vê bûyerê kirine jî lêpirsîn li wan hatiye vekirin û gelek kes hatine girtin. Dozgerên pergalê gotine ev kesên henê zererê didine doza wan ya netewî! Lê rastiya vê ev e; ew kes Kurd bûn, ji ber wê mirin heq kiribûn û mirina wan her bi çi awayî be ne gelek girîng e. Ji ber wê divê ti kes behsa kuştina wan neke, kesê ku behsê bike jî sûcdar e.

Dîsa di hefteya borî de polîsekî li Şirnexê bi seyareya xwe bi zanebûn da ser xortekî Kurdê parêzer û birîndar kir. Gotiye ku "cin"an ji min re gotiye bide ser wî! Erê ew "cin" mentalîteya pergalê ye. Ew perwerdeya ku pergalê daye wan e. Pergalê tovê kîn, buxd û neyartiya li himberî Kurdan ewqasî zexim di binhişiya wan kesan de reşandî ye, êdî dar û ber jî diaxivin û dibêjine wan Kurdan bikujin! Ez nizanim hetanî niha çend zarokên Kurdan bi vî awayî hatine kuştin yan jî seqet kirine. Lêbelê ez dizanim ku hetanî niha kesek tinê jî ji wan qatilan nehatiye cezakirin. Heta ew kes di çavê pergalê de qehreman in. Dîsa çi li girtîgehan çi li derve polîs û leşkerên pergalê destê xwe tavêjin namûsa keç û jinên Kurdan. Lê heta niha ti kes ji wan nehatiye cezakirin. Û nayên cizakirin jî, lewre pergal wan bi vî awayî perwerde dike û dixwaze vîn, bîr û baweriya civakê qels bike û têk bibe. Divê gelê Kurd jî li gorî vê, zarokên xwe perwerde bike.

# Hemleya paqijiyê ya TEV-DEM`ê li Qamişlo berdewam e

## Hemleya paqijiyê ya TEV-DEM`ê ku 28`ê Adarê dest pê kiriye, li Qamişlo berdewam e.

Endamên Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM), Nivîsgeha Ciwanan a tevgerê û şêniyên taxa Tey a Qamişloyê tev li hemleya paqijiyê bûn.

Beşdarên hemleyê li pêşiya Çerxerêya El-Selam a li rojhilatê Qamişloyê kom bûn, qad û kolanên heta Çerxerêya Şehîd Xalid Osman a li taxa Tey paqij kirin.

Têkildarî hemleyê, şêniyê bi navê Fîgan Elî spasiya TEV-DEM`ê kir û got: "Hemleyên paqijiyê bi tenê têrê nakin. Divê welatî erkên xwe bînin cih û bajarê xwe paqij bihêlin."
Hemle heta niha li taxên Enteriye, Kanal Siwês, Cumaiye, gundê Um El-Fursan, Nimetlî, herêma Pîşesazî û taxa Tey pêk hatiye.
*ANHA*





# Li gunderwarê Dêrezorê ji ber kêmbûna avê çandinî ne baş e

**Jinên gundewarê Dêrezorê yên ji karê çandiniyê hes dikin û çandinî di heman demê de ji bo wan riya debarê ye, diyar kirin ku ji ber pêşîgirtina ava çemê Firatê herwiha bihayê zêde yê dermanê çandiniyê, nikarin baxçeyên xwe av bidin.**

Jinên ku li gundewarên Dêrazorê, bakur û rojhilatê Sûriyeyê karê çandiniyê dikin, nikarin dev jê berdin. Ji ber ku hînî keda destên xwe bûne û bi xwe debara xwe dikin naxwazin hewcedarî kesên din bibin lê werza îsal jî weke çend salên borî, ji ber kêmbûna avê bi bandor bûye û zirarê dide jiyana gelek malbatan.

### Ji bir girtina ava çemê Firatê karê çandiniyê zehmet bûye

Karê çandiniyê di serî de ji mêran zêdetir dikeve ser milên jinan. Jin erdê cot dikin, paqij dikin, giha jê berhev dikin û karên din dikin. Beşa çandiniyê li Dêrezorê di van sê salên borî de rastî xirabûneke berbiçav hatiye. Ji ber ku dagirkeriya Tirkiyeyê pêşiya ava çemê Firatê girtiye ku wek kaniya jiyanê ya herêmê ye; her wiha qutbûna wê bûye sedema zêdebûna kêşeyan. Hasna El-Heşeş a 45 salî, jineke cotkar e ji bajarê Hecînê ye der barê karê xwe yê çandiniyê de wiha dibêje: "Em ji demên kevnar de cotkar in. Em li nava zeviyên xwe dixebitin, genim, ceh, pembû û zebzeyan diçînin. Ji ber kêmbûna piştevaniyê, zehmetiya cotkirina axê ji ber tunebûna sotemeniyê û nekarîna me ya anîna tov û zibilan ji ber bihabûna wan zehmetiyan dikşînin. Ji bilî van hemû zehmetî û azarên kêmbûna avê rewşê girantir dike. Pêdiviya van projeyan bi lênêrîn û baldariyê, paqijkirina erd ji giyayan û parastina wê ji kêzikên ku zirarê didin nebatan heye."

### "Tevî zehmetiyan jî em naxwazin dev ji çandiniyê berdin"

Hasna El-Heşeş tîne ziman ku ew îsal di çandiniya demsalê de dereng mane û wiha domand: "Me gelek derengî çandinî kir, ji ber ku rengê giya zer bû, ji ber nebarîna baranê. Çandinî jî pêdivî bi avdana berdewam heye ji bo ku giya hişk nebin lê avdana îsal pir buha ye her donimek ku em



av didin 13 hezar lîreyên Sûriyeyê ye. Ligel nêzîkbûna erdên me bi çemê Firatê re, avdana me zehmet e, ji ber ku dewleta dagirker a Tirk pêşî li ava çemê Firatê girtiye, asta avê gelekî kêm bûye. Em bang li rêxistinên navneteweyî dikin ku zextê li Tirkiyeyê bikin pêşiya ava çem vekin û wê hesabên qirêj li ser tîbûn û birçîbûna bi milyonan mirovan nekin. Hesna El-Heşş her wiha banga piştgirîdayîna projeyên çandiniyê dike, di nav de avdanî, tov, derman û pêdiviyên din ên çandiniyê jî hene. Tevî van hemû zehmetiyan, em nikarin dev ji çandiniyê berdin, ji ber ku çavkaniya me ya sereke ye."

### "Ji ber tinebûna avê em bîran dikolin lê ji bo çandiniyê ava şîrîn baştir e"

Ji aliyê din jina cotkar Hemda El-Hamid got: "Em debara xwe bi çandiniyê dikin lê ji ber bihayê zêde em di peydakirina semad, avdan û dermanan de zehmetiyên mezin dikşînin."
Hemda El-Hamid sebzeyên havînê diçîne lê kêmbûna avê wê neçar kiriye ku biçe bîran bikole. Li ser wê yekê dibêje ku di encama şorbûna avê de çandinî gelek kêm bûye û bal kişand ku ya herî baş avdana bi ava şîrîn e.

### "Ti qanûnên mirovî qebûl nakin ku şer li ser girtina avê bê kirin"

Der barê van kêşeyan de, hevseroka Rêveberiya Çandiniyê ya Hecînê Amina El-Salem got: "Îsal em rastî gelek kêşeyan tên, bi taybetî kêmbûna ava çemê Firatê, li Dêrezorê çandinî di bin xeterê de ye û wiha li axaftina xwe zêde kir: "Çandinî di salên borî de têk çû û îsal, buhayê zêde yê her tiştî, kêşeyên li pêş çandiniyê, zêdetir kiriye digel berdewamiya kêmbûna avê ku ji bo vê beşê karesatek nîşan dide. Jixwe Midûriyeta Çandiniyê hewl da çareyan bibîne da ku demsala mayî rizgar bike, wê dikaribû ji herêma Ebû Herdûb heta Baxozê zehmetiyan derbas bike."
Amina El-Salem di dawiya axaftina xwe de bang li rêxistinên navneteweyî û Neteweyên Yekbûyî kir ku rasterast destwerdanê bikin û wiha got: "Tu qanûna mirovî qebûl nake ku bi gel re şerê tîbûnê were kirin."
*ANHA*

# Di şevên Remezanê de lîstikên kurdewarî

**Vedana kon, stiran û lawikgotin, lîstika kumik çalakiyên şevên Remezanê yên welatiyên Hewlêrê ne. Pîr, ciwan û zarok şevên Remezanê li Parka Şanedar kom dibin û di binê kon de lîstikên kurdî yên kevin dilîzin.**

Lîstika kum yan jî lîstika gustîlkê, lîstikeke kevin ya kurdî ye, bi taybetî di şevên dirêj ên demsala zivistanê de tê lîstin û girîngiyê didin vê lîstikê. Li bajarê Hewlêrê hê ev lîstik tê lîstin, dewreyek ya lîstika kum (yanî klaw) hatiye destpêkirin û wê heta dawiya meha Remezanê berdewam bike.

Navenda Heyranbêjên Hewlêrê dewre vekiriye û 64 tîm tevlî bûne. Her şeva Remezanê ciwan û welatî di bin kon de kom dibin û bi guhdarkirina heyranok û stranên foklorî yên Kurdî lîstika kum dilîzin.

Rêveberê vê çalakiya çandî, Rênas Tahîr ji Rojnews'ê re axivî û got: "Ev du sal in, wiha her şeva Remezanê, di saet 21.00'an heta saet 24.00' an lîstika kum dikin. Bi gotina heyranok û lawikan şeva xwe derbas dikin. Armanca organîzekirina vê lîstikê, zindî hiştina lîstikên kevin ên foklorî yên Kurdî ne ku kevin şevên dirêj ên zivistanê dihatin



lîstin. Li gel jî heyranok û lawikên Kurdî dihatin gotin. Rênas dibêje, "Şev kesên temenê wan cuda li vir kom dibin û dibe sedem ku ji teknolojiyê û torên civakî dûr bikivin."

Yek ji welatiyên tevlî şevê dibe û şaraziya wî li ser lîstika kum heyî Aram Behar ji Rojnews'ê re got: "Ji bo me cihê dilxweşiyê ye ku lîstikek kevin a Kurdewarî zindî bihêlin. Şevane hejmarek zêde ji ciwanan û kesên din berê xwe didin vê lîstikê."



Lîstika kum dîrokek xwe ya kevin heye. Li her çar parçeyên Kurdistanê bi awayê cuda tê lîstin. Lîstik ji 9 kuman pêk tê. Di nava yek ji kuman de gustîlek tê veşartin. Bi awayê du tîm an grûb, li hemberî hev dilîzin. Her tîm ji 3 heta 8 lîstikvanan pêk tê. Lîstik çend saetan berdewam dike. Ji tîman kîjan berê 100 pileyan bi dest bixe dibe yekemîn.
*ROJNEWS*



# "Li herêmên dagîrkirî kiryarên herî qirêj li ser jinan tên kirin"

## Endama Komîteya Penaberên Serêkaniyê, Zehra Semo da zanîn ku jinên li herêmên ji aliyê dewleta Tirkan û çeteyên wê ve hatîn dagîrkirin dimînin, rastî her cure tundî, heqaret, revandin û kuştinê tên.

Ji destpêka aloziya Sûriyeyê ve, yên herî zêde berdêl dane jin bûn. Jin li herêmên hikumeta Şamê tên paşguhkirin, li herêmên dagirkirî jî rastî şîdet û tecawuzê tên. Jinên li Sûriyeyê, ji ber şerê ku rû daye, êşa windakirina zarok, hevjîn an jî xizmên xwe dijîn her wiha êşa windakirina mal, milk û warê xwe jî dikşînin. Sê sal di ser dagirkirina Serêkaniyê û Girê Spî û koçberiyê re derbas bûn û hê jî kuştin, gef, tecawizkirin, guhertina demografîk di astên bilind de ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve didomin, sûc û binpêkirinên xeter li dijî gelan pêk tînin. Bi vî awayî mafên jinan li Suriyeyê tên binpêkirin. Endama Komîteya Penaberên Serêkaniyê Zehra Semo axivî.

### "Jin li herêmên dagrikirî rastî hemû cureyên şîdetê tên"

Zehra Semo da zanîn ku sûcên dewleta Tirk li herêmên dagirkrî pêk tîne dijexlaqî ne û wiha got: Komîteya me di sala 2020'an de hat avakirin, armanca me ew e ku em bikaribin kar û xebatê di nava koçberan de bikin û asta berxwedaniyê bilind bikin da ku em vegerin cih û warê xwe. Di heman demê de rewşa xelkên ku li Serêkaniyê dijîn, bi taybetî rewşa jinan em dişopînin û hewl didin ku belgeyên şênber ên wehşet û îşkenceya li dijî jin, zarok kal û pîran ji aliyê dewleta tirk û çeteyên wê ve pêk tên bi dest bixin. Li gorî şopandina me niha 423 kes li Serêkaniyê û Girê Spî di zndanan de tên girtin, di nava wan de 55 jin û 15 zarok hene. Li Serêkaniyê 77 jin rastî tecawizê hatine û 4 kes ji sivîlan hatine qetilkirin. Em ê ji bo derxistina sucên ku dewleta Tirk a dagirker li herêmên dagirkerî pêk tîne kar û xebatê bidomînin û asta têkoşînê bilind bikin."

### "Dixwazin çand û dîroka xwedawendiyê winda bikin"

Zehra Semo teqez kir ku Girê Til Xelef bi çanda jinan û xwedawendiyê tê zanîn, bi dagirkerina Serêkaniyê re dîrok hedef hatiye girtin û wiha anî ziman: "Bajarê Serêkaniyê bi mozayîka gelan tê naskirin. Bi Kurd, Ereb, Suryan, Çaçan û Çerkezan zengîn e. Hemû netew di bin sîwana projeya Neteweya Demokratîk de hevgirtina xwe xurtir kirin û bûn nimûne di tevahî Sûriyeyê. Di aliyekî din de Girê Til Xelef girekî dîrokî ye. Çanda Til Xelef çanda jinan û xwedawendiyê ye û çandeke mirov dikare bêje kurdewarî ye. Lewma du caran êrîş li ser Serêkaniyê pêk hat yekê hevgirtina gelan hedef girt û ya din jî windakirina dîroka Til Xelef û diziya şûnwaran esas girt. Bi dagirkerina Serêkaniyê re li gorî şopandina me çeteyên girêdayî dewlat Tirk a dagirker Girê Til Xelf dikolin û berhemên şûnwaran dizin. Cihên pîroz wekî Goristana Şehîdan veguherandin cihekî leşkerî. Cihê ku her sal Newroz lê dihat pîrozkirin îsal veguherandin cihekî leşkerî. Ev nîşan dide ku dewleta Tirk a dagirker dixwaze cihên dîrokê hemû xera bike û ji bo xwe dîrokek nû bide avakirin."

### "Dagirkeriya Serêkaniyê bû sedema derxistina aloziya aborî"

Zehra Semo destnîşan kir ku bi dagrikrina Serêkaniyê re aloziya aborî û avê li kantona Hesekê hatiye jiyîn û wiha bilêv kir: "Serêkaniyê jêdera afirandina jiyanê ya li Kantona Hesekê bû. Di milê avê de Stasyona Elok, di milê aborî de zengîn bû. Hemû zebzeyên Kantona Hesekê ji Serêkaniyê dihatin. Dema hat dagirkerin plan û siyastek qirêj li dijî xelkê kantona Hesekê hat meşandin û aloziya avê û aborî derket holê. Li dijî hemû kiryarên dijmirovî yên li ser gel tên meşandin dewlet bêdeng man lê di şerê Ûkraynayê de her kesê dengê xwe derxist, mudaxele kir ev tê wateya ku plan yek e. Komploÿek qirêj tê meşandin dixwazin gel neçarî koçberiyê bikin û guhertinên demografîk pêk bînin."

### "Li herêmên dagirkirî kiryarên dijmirovî tên kirin"




Zehra Semo bal kişand ser hovîtî û destdirêjiya ku li ser jinan li herêmên dagirkirî pêk tê û wiha pêl da axaftina xwe: "Tiştên ku li herêmên dagirkerî Serêkaniyê, Girê Spî û Efrînê diqewimin digihîjin asta sûcên şer û sûcên dermirovî. Dewleta Tirk pêkanîna sûcan li dijî jinan li bakur û Rojhilatê Sûriyeyê- Rojava dike da ku tola ji rola jinên pêşeng di şikandina terorê li Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî hilîne û derbeyek li projeya neteweya demokratîk bixe. Ji ber ku di bin sîwana vê projeyê de jin xwedî biryar in, jinan tevahî mafê xwe bi dest xistine û di asta siyasî û rêvebirinê de kar dikin. Lewma sûcên revandin, qetilkirina, destdirêjiya zayendî, destdirêjiya li jin û zarokan û zewicandina zarokên keç bi darê zorê, îşkenceya fizîkî û derûnî berdewam dikin."

### "Li herêmên dagirkirî jin li hêviya rizgarkirinê ne"

Zehra Semo wiha dawî li axaftina xwe anî: "Rast e gelek caran me bang kiriye ku rê li ber kiryarên dewleta tirk bê girtin lê dewletên ku xwe ji mijarê dûr dixin û paşguh dikin divê dawî li bêdengiya xwe bînin. Hê jî kiryarên terora DAIŞ'ê yên li ser jinên Şengalê di bîra me de ye. Divê rêxistinên mafên mirovan û yên jinan dengê xwe bilind bikin û hesab ji dewleta tirk bipirsin. Îro Bi hezaran jin di herêmên dagirkirî de heya vê kêliyê rastî hemû cureyên tundiyê tên û li hêviya azadî û rizgarkirinê ne. Çawa me bi berxwedaniya jinan dest pê kir û gavên pîroz avêtin em ê bi berxwedana jinan di kampan de û di bin şert û mercên herî zehmet de asta berxwedaniyê bilindtir bikin, dagirkeriyê têk bibin û vegerin ser axa xwe."
*JINHA*

# Bi ronîkirina tarîtiyê wê tekoşîna azadiyê bi ser bikeve



Eylem Şoreş/rojnamevan

**Di destpêkê de dixwazim roja rojnamevaniya Kurdî li tevayiya hempîşeyên xwe pîroz bikim û di vê rojê de şehîdên raqihandina azad û di şexsê wan de tevayiya şehîdên riya azadiyê bi rêzdarî bîr tînim. Di van salên dawî de encama xebatên salan tê dîtin. Ragihandina azad li dijî tevayiya êrişan xwe pêş xist û xwe pêş dixe, dibe bersiv.**

Di heman demê de qadên xebata ragihandina azad, her ku diçe firehtir dibin. Dibe ku televîzyona jinan di vê çarçoveyê de yek ji saziyên herî nû be, lê li wir jî em dibînin bê ka ezmûnên salan yên qada ragihandinê bi manewiyatê çawa bi pêş ketin. Cihê ku herî zêde niha êriş li ser qada ragihandinê tên kirin Bakurê Kurdistan û Tirkiyê ye. Piştî wê jî Başûr û Rojhilat tên. Qada şoreşê jî bû bingeha ragihandina pergala demokratîk. Lê tê dîtin ku li dijî wan êrişan seknek têkoşînê heye û li ser şopa Nûjiyan, Denîzan û bi dehan şehîdên azadiyê riya ragihandina heqîqetê balê dikişîne. Mane, ragihandin amûra xwe gihandina civakê û bûyîna dengê wan e, eger mirov niha binêre dikare bibîne ku heta astekê ev yek bi awayek xurt pêş ket.

### Rojnamevanek di girtîgehê de dibe dengê girtiyan, gelo beriya wê li kû cêbûye?

Me qala êrişan kir, desthilat li her welatî dixwaze xwe mayînde bike û bi vî riyê jî çawa ku yekziman, yekreng û yekolî li mirovan ferz dike bibe tekane dengê ku xwe digihîne civakê jî. Riya rastiyan veşartin, di riya bêdengkirina muxalefetê derbas dibe. Her dema ku dibînin rojnamevanên çapemeniya azad rastiya derewên wan û lîstokên wan radixe ber çavan, ew êrişên xwe zêde dikin û dixwazin dengê azadîxwazan qut bikin. Lê li dijî êrişan helwesteke xurt ya vê qadê heye. Li dijî destgîrkirinê, ji bo her pênûsa ku ket hevalên derdorê bi helwesta parastina hev û xurtkirina hevdû tev digerin. Hêza di qada ragihandina azad jî hevaltiya xurt û lêgerîna rastiyan e. Rojnamevanek ku ji girtîgehê karê xwe didomîne û dibe dengê girtiyan, beriya wê li ku hat dîtin gelo? Belê dema mirova van tiştan dibîne dikare bi nêrîneke zelal karê xwe bidomîne. Ne tenê di vê qadê de, polîtîkayên qirkirina siyasî li Bakurê Kurdistanê û Tirkiye di asta herî jor de ne. PDK'ê jî bi polîtîkayên xwe kêmî vê namîne. Êriş bi bêtehmuliya hêzên dewletê pêş dikevin. Ev yek tê maneya ku ragihandina azad jî weke qadên din di nava têkoşînê de ye û bi ahengeke xurt xwedîderketin jî pêş dikeve. Însan dema bandor li xwe û derdora xwe dike gelek tişta dibînin û hîs dikin. Niha jî gihîşt vê astê ku, yek raya giştî jî bi saya ragihandina azad û xebatên giştî yên tevgera azadiyê dikare wan rastiyan bişopîne, bibîne û bibe parçeyek ji vê.

### Ji bo derbaskirina kêmayiyan, pêşxistina bîrdoziya azadiyê

Bêguman kêmasiyên vê qada kar gelek in. Lê mirov bi şaşitî û kêmasiyên xwe fêr dibin û ezmûnên xwe bi encam dikin. Yek ji kêmasiya berçavan firehkirina qadê û xwe pêşxistin e. Her mirovek ku vî karî dimeşîne divê di destpêkê de bizanibe ku tişta ew dizanin hîn ne tiştekî ye û bi vî awayî vekirî be da ku her tim sînorên xwe derbas bike. Di nava jiyana ku pêşengên me bi sekna xwe xetekê diyar kirin de divê çavên me jî her li rê bin ku vê xetê bişopînin û ji xwe zêdetir ev kar bibe bingeh, şoreş çawa bi berdêlên mezin pêk tê ewqas jî qadên di nava vê de berdêlên mezin dixwazin. Bi çaveke vekirî û nêrînek birdozî gelek kêmasiyên heyî, dikarin bên derbaskirin.
Ji bo pêşxistina têgeha girêdayî bîrdoziya azadiyê divê hîn gelek kar were kirin, lê herî baş ew e ku em her yek ji aliyê xwe ve dest pê bikin û bi vî awayî bi pêş ve biçin.

### Şopedarê riya heqîqetê bin

Lê hîn kareke mezin û berfireh bi berpirsyariyek mezin li ber her yek ji me heye. Bi hêvî me ku di dema pêş de ev ezmûnên di salên borî çawa derbasî rojên îro bûne wê heman tiştî di dema pêş de jî çêbibe. Bi vî awayî mîrateya şopa riya heqîqetê her dikare were domandin û daxwazên şehîdan û berxwedana wan wê li nîv riyê nemîne. Wê di encamê de hemû hewldanên bêdengkirina dengê rastiyan bêencam bin û wê heqîqet her tim riya xwe bibînin. Bi ronîkirina tarîtiyê re wê têkoşîna li qada ragihandinê û li her qadê ber bi serkeftinê ve bimeşin.

# ‘Dorpêçkirina rejimê ya taxên Helebê encama hişmendiya wê ya desthilatdar e’

Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk Xerîb Hiso da zanîn ku, armanca sereke ya dorpêçkirina taxa Şêx Meqsûd û Eşrefiyê ji aliyê hikûmeta Şamê ve, şerê li dijî îradeya gelê Kurd e. Herwiha got, ev ne tişteke nû ye, ji berê ve rejimê gelek caran bûye sedema aloziyê.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Bi destpêkirina şoreşa Rojava taxa Şêxmeqsûd rastî gelek êrişan ji aliyê rejima Sûrî û dagîrkeriya tirkî ve hat. Van êrişan pênc salan dewan kir. 2012`an dest pê kir û di 2017`an de bi rizgarkirina taxên rojhilatê Helebê bi dawî bû. Ji ber wê jî ev tax bû mînaka berxwedana gel. Lê niha careke din rejima Sûrî ambargo daniye ser taxê. Ji 13`ê Adara derbasbûyî ve nahêle ti pêdiviyên jiyanê, herwiha derman û sotemenî derbasî taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bibin. Ji bo wê jî gelê bakur û rojhilatê Sûriyê ev dorpêç şermezar kirin û helwesta xwe li hemberî rejimê diyar kirin.
Têkildarî mijarê Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Xerîb Hiso nêrînên xwe ji me re anîn ziman.

**‘Rejimê her tim alozî derxistîne, ti caran nebûye cihê çareseriyê’**

Xerîb Hiso da zanîn ku ne cara yekê ye ku rejima Sûrî vî karî li hemberî gelê Şêx Meqsûd dike û axaftina xwe wiha domand: “Gelek caran rejimê êrişî Şêx Meqsûd kiriye. Lê her çiqas kiribe jî bi ser neketiye. Rejim her tim aloziyan çêdike, ti caran nebûye cihê çareseriyê. Çimkî zihniyeta wê zihniyeta tevliheviyê ye û xwe li ser esasê aloziyê mezin kiriye. Ev zihniyet jî bûye belaya serê wan. Ji bo wê jî her tim û li her deverê êrişî Kurdan



dike û dixwaze îradeya gel bişkîne.”

**`Dorpêça heyî êrişa li dijî îradeya gel e`**

Xerîb diyar kir ku demek e taxa Şêx Meqsûd û Eşrefiyê di binê ambargoyeke giran de ne û ev li axaftina xwe zêde kir: “Nêzî du mehan e, rjimê derfet nade ku şekir derbasî Şêxmeqsûd bibe, niha jî nahêle ard û pêdiviyên weke din derbas bibin. Hêdî hêdî vê hişt ku ev dorpêç bibe aloziyeke mezin. Di hundirê vê dorpêçê de tiştеke balkêş ku niha derdikeve pêş heye, ew jî tîma çaran e û nayê zanîn ka ev tîm perspektîfên xwe ji kû digire. Çimkî niha hin alî dihêlin ku pêdivî derbas bibin, lê tîma çaran nahêle. Ev yek tê wateya ku hikûmetek di hundirê hikûmetekê de hatiye sazkirin. Tê xuyakirin ku ev tîm girêdana wê bi MÎTA Tirkan re heye. Şêx Meqsûd û Eşrefiyê gelê Kurd, Ereb, Suryan lê dijîn. Ji bo wê jî dewleta tirkî ya dagîrker çawa ku gelê Efrînê tengav kir, niha jî bi hevkariya rejima Şamê dixwaze Şêx Meqsûd û Eşrefiyê tengav bike. Her du alî li ser vê dorpêçkirinê di nava itîfaqê de ne. Lê yê herî zêde berpirsiyariya vê dorpêçê dike rejima sûrî ye. Ji bo wê jî dorpêça heyî êrişek li dijî îradeya gel e. Lê bila rejim baş zanibe ku bi vê êrişê tiştekî bi dest naxe. Çimkî ev êriş li ser îradeya gelê Sûrî bi tevî tê meşandin, ne li ser îradeya gelekî tenê. Taxa şêx Meqsûd û Eşrefiye rola wan ya sereke heye. Eger rejim alozî di hundirê vê taxê de dide çêkirin wê demê pîvanên sisyasî tên dahurandin û rê li pêşiya tiştên bixeter vedike.”

**`Dewamkirina ambargoyê tê wateya neamedebûna rejimê ji çareseriyan re`**

Xerîb Hiso got, eger ambargo bê rakirin û rê li pêşiya vê taxê were vekirin, herwiha îradeya gel were qebûlkirin, wê taxa Şêx Meqsûd û Eşrefiyê karibin bi bajarê Helebê re meclisa xwe ava bikin û tê de çareserkirina bi giştî bê çêkirin. Ev tişt ji rejimê û rêveberên Helebê tê xwestin ku bi hev re bigihin aramiyê. Me berî niha jî daxwaziya çareserkirinê dikir, lê mixabin hêzên derve yên desthilatdar nedihiştin ku çareserî



çêbe. Lê eger çareserî çênebe tê wateya ku rejima Sûrî ji çareseriyan re ne amade ye û gelê vê taxê qebûl nake. Li şûna ku rejim faydê li gelê Sûrî bike li dagîrkeriyê dike.

**`Yê ku li vê civakê xwedî derdikeve wê bi ser bikeve`**

Di dawiyê de Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Xerîb Hiso, da zanîn ku parastina esasî û ya rast di nava civakê de ye û got, ew çiqas ambargoyê daynin û zextê li civakê bikin, gel ewqas pêwîstiya xweparastin û xwedîderketina li vê xakê dibîne. Herwiha yê ku li vê civakê xwedî derkeve û biparêze wê bi ser bikeve. Lê kiryarên rejimê û hevkariya wê bi dewletên din re ne di berjewendiyên wê de ye. Ji bo wê jî em bi hêvî ne ku rejim li xwe vegere û di demên pêş de çareseriyeke demdirêj çêbe ne demkî be.



## PDK ji şerê bi PKK`ê re ditirse!

Dilyar Cizîrî

Komîteya Têkiliyên Derve ya KCK`ê di dawiya meha Adarê de bi daxuyaniyekê aşkere kir ku dewleta tirkî û PDK amadekariya êrişa ser herêmên gêrîla yên başûrê Kurdistanê dikin. KCK`ê da zanîn ku li gorî agahiyên girtîn wê êriş 15`ê nîsanê pêk bihata. Piştî daxuyaniyê ajansa nûçeyan ANF`ê jî li ser zimanê çavkaniyên herêmî, plana êrişê piştrast kir û hin hûrgiliyên wê eşkere kirin. Li gorî plana wan wê vê carê êrişa di aliyê bejayî de pêk bihata û yekser çekdarên PDK`ê serkêşiya êrişê bikiran. Bi van daxuyaniyan plana dewleta tirkç û PDK`ê hat eşkerekirin. Niha jî piştî serdana Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî ya Tirkiyê û hevdîtina bi Erdogan re diyar dike plana xwe guhertine û wê bi rêbazeke din êriş bikin.
Balkêş e ku serdana Mesûr Barzanî piştî serdana Erdogan û Wezîr Parastinê yê tewleta tirkî Hulusî Akar ya xeta sinor û Geverê, pêk hatiye. Ev jî diyar dike ku dewleta tirkî amadekariya xwe ji bo êrişeke nû temam kiriye. Lê di serdana Mesrûr Barzanî û hevdîtina wî bi Erdogan re hin xalan diyar dike. Her çendî ragihandina PDK`ê dibêje serdana Mesrûr Barzanî bi armanca nîqaşkirina mijara gaza xwezayî ya başûrê Kurdistanê ye, lê ji rêbaza rûniştinê û heta sîstema civînê diyar e ku Erdgoan, Mesûr Barzanî biriye ku fermanê bide wan û erkê wan di planê de diyar bike.
Erdogan her çendî şandeyên PDK`ê piçûk dibîne, lê vê carê di protokolê de qet weke şandeya herêmeke federal pêşwazî nekiriye. Erdogan bi vê jî dixwaze ji PDK`ê re bêje hûnû li gorî min tev bigerin û vê carê bixwe bikevin şerê li dijî PKKê. Di nerîna min de rayedarên PDK`ê bixwe jî baş dizanin wê di şerekî muhtemel yê li dijî gêrîlayan de winda bikin. Dibînin ka dewleta Tirkan li hemberî gêrîlayên demê çi derban dixwin, îcar wê çekdarên wan çawa karibin li ber xwe bidin. Ji ber wê xuya ye rayedarên PDK`ê li ber Erdogan xwe didin vir û wir. Dixwazin ketina wan ya şer ne bi awayekî berfireh be. Lewra baş dizanin çekdarên wan berê li Şingal û Kerkûk û herêmên din şer nekirine. Niha jî wê nikaribin li hemberî gêrîlayan li ber xwe bidin.
Xuya ye Erdogan jî bi vê êiçûkxistina Mesrûr Barzanî di dema pêşwazîkirinê de ferman dayiyê û jê re gotiye, divê hûn bikevin şer.
Di nerîna min de berî niha ew agahiyên gihiştîn ANFê ku wê êrişek pêk were, bi destê rayedarên PDK`ê ye. Lewra naxwazin yekser wekî tirk dibêjin, bikevin şer. Ne ku welatparêzin û dilê wan li ser başûrê Kurdistanê ye, ji ber li baş dizanin wê nikaribin beramberî gêrîla şer bikin. Di heman demê de wê şerê wan yê li hemberî gêrîla di warê siyasî de jî zirareke mezin bide wan. Bi taybetî ji ber nakokiyên wan yên bi partiyên din yên Başûr re û di heman demê de nakokiyên wan yên di li ser asta Iraqê tê zanîn. Îcar wê di rojên pêş de xuya bibe ka wê rola PDK`ê di êrişa muhtemel de li gorî xwesteka Erdogan be, yan wê PDK bi bê dengiya xwe û dayîna agahiyên istxbaratî dewleta Tirkam razî bike. Ev jî niha dema Artêşa Tirkam ciwanên Kurd ji Başûr winda dike û PDL naxwaze mijarê bibîne rastiyan nîşan dide.
PDK bi vê, peyama tu çi dikî bike û emê bi her awayî alîkariya we bikin, dide dewleta tirkî. Dewleta tirkî jî êdî van alîkariyan bes nabîne, dixwaze ew bixwe bikevin nava şer.

# Armanca êrişên dagîrkeriyê qirkirina azadîxwazan e

**Mihemed Xanim / Qamişlo**

**Roşîn Mûsa diyar kir ku armanca dagîrkeriyê qirkirina gelê azadixwaz e û got, divê em hêza civakê bikin bingeh û li ser bingehê çanda gelê berxwedêr li ber xwe bidin. Lewra ti hêzên navdewletî wê gel neparêzin.**

Di nava bêdengiya cîhanê de, dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên girêdayî wê gefên xwe li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zêde dikin. Bi êriş û şerê taybet dixwazin herêmê ji gelên wê yên resen vala bikin. Bi armanca têkbirina projeya biratiya gelan, dagîrkeriya tirkî bi hemû hêzên navnetewiyî û herêmî re di nava liv û tevgerê de ye. Bi bazarên xewe yên qirêj, dixwazin gelan ji azadiyê dûr bixin. Li ser vê mijarê endama Meclisa jinan ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Roşîn Mûsa ji me re axivî.

Roşîn diyar kir ku siyseta qirkirinê ya dagîrkeriya tirkî ya li dijî gelên herêmê ne tiştekî nû ye û axaftina xwe wiha domand: “Dewleta tirkî ya dagîrker, dixwaze xwe li bakurê Sûriyê bi cih bike û siyaseta xwe li ser vî bingehî dide meşandin. Li dijî têkoşîna gelên herêmê, êrişên xwe yên hovane didomîne. Herwiha dixwaze bi şerê pskolojîk îrade û baweriya azadîxwazan bişkîne. Tirkiyê wekî dewleteke netewperest û faşîst tê nasîn. Dixwaze ji kirîzên Rojhilata Navî sûdê bigre û dagîrkirina xwe li herêmê fireh bike. Niha jî dixwze ji şerê di navbera Rûsya û Ukrayna de hin tiştan qezenc bike.”

Roşîn da zanîn ku siyaseta dewleta tirkî ya faşîst ji her kesî re eşkere bûye û wiha dewamî da axftina xwe: “ Siyasta dewleta tirkî zelal e, Projeya Biratiya Gelan ya demokratîk û aştîxwaz qet qebûl nake. Eşkere dibêje, hebûna statûyeke demokratîk ji me re bixeter e. Ji ber wê gef û êrişên dagîrkeriya tirkî li ser herêmê wê di rojevê de bin.”

Roşîn da xuyakirin ku dewletên wekî Rûsya û Amêrka, ji bo berjewendiyên xwe beşdarî krîza Sûriyê bûn û axaftina xwe wiha domand: “Dagîrkeriya tirkî li ber çavê tevayiya cîhanê komkojiyan dike. Rûsya û Amerîka qaşo li herêmê garantor in lê xwe bêdeng dikin. Niha jî dixwazin gelê Kurd ji bo berjewendiyên xwe bikin gorî. Lê wê negihin armanca xwe. Lewra bê gelê Kurd çareseriya krîza Sûriyê ne pêkan e.”
Roşîn bal kişand ser hevdîtinên di navbera hikumeta Şamê û dagîrkeriya tirkî de û wiha axivî: “Têkiliyên ewleyiyê di navbera hikumeta Şamê û dagîrkeriya tirkî de qut nebûne. Bi hev re dicivin û planan saz dikin. Ji bo têkbirina projeyên demokratîk çi ji destê wan tê dikin. Xetera êrişeke nû ya li ser bakur û rojhilatê Sûriyê heye. Ji ber wê ji bilî berxwedanê ti çare nînin” Endama Meclisa jinan ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Roşîn Mûsa ji gelên herêmê xwest ku



rêxistina xwe xurt bikin û axaftina xwe wiha qedand: “Pêwîst e em hêza civakê bikin bingeh û li ser bingehê çanda gelê berxwedêr li ber xwe bidin. Lewra ti hêzên dinyayê wê gel neparêzin. Çavên dewletên faşîst li ser herêmên Rêveberiya Xweser e. Ji ber wê Rêveberiya Xweser ji bo berxwedana li hemberî êrişan di nava amadekariyê de ye. Çawa bakur û rojhilatê Sûriyê bû sembola berxwedanê, berxwedan jî wê berdewam be û wê êriş têk biçin.”



# Navenda ragihandina HPG’ê: 28 dagîrker hatin cezakirin, 2 helîkopter hatin derbkirin!

Dewleta tirkî ya dagîrker bi piştgiriya PDK’ê, li herêma Avaşîn û Zapê ji bejê û hawa ve dest bi êrişên dagîrkeriyê kir. Di daxuyaniya HPG’ê de hat zanin ku ji aliyê gerîlayên azadiyê ve 28 dagîrker hatine cezakirin, 9 dagîrker birîndar bûne û 2 helîkopterên êrişê hatîne derbkirin.

**Navenda Nûçeyan**

Navenda Ragihandina HPG’ê derheqê êrişên artêşa dewleta tirkî ya dagîrker û berxwedana gerîlla de daxuyaniyek da.
Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku di berdewama êrişên ku ev salek e didomin de, 14-17 Nîsanê êriş li ser herêmin medya pir zêde bûne û êvara 17’ê Nîsanê jî artêşa Tirkan êrişeke dagîrkeriyê bir ser herêma Avaşîn û Zapê de daye despêkirin. Hat zanîn ku gerilayên azadiyê li qada Werxelê bi rêbaza sabotajê li dagîrkerên ku hewl didan xwe li qada Werxelê bi cîh bikin xistîne û di vê çalakiyê de 8 dagîrker hatine cezakirin. Herwiha HPG’ê ragihand ku piştî artêşa dewlata tirkî ya dagîrker derb xwar leşkerên xwe yên li erdê vekişandin, herêm bi dijwarî bombebaran kirin.

**Di daxuyaniyê de wiha hat diyarkirin:**

“Bi şev saet di 01:30’î de li dijî dagirkerên ku dixwestin li girê Werxelê bi cih bibin, bi çekên ferdî û nîvotomatîk, dest li wan hat werdan. Li vê derê 2 dagirker hatin cezakirin. Balafirên şer jî saet di 02:45’an de bombe li vê qadê barandin. Bi şev saet di 03:10’an Saet di 03:40’î de li dijî komeke dagirkeran a hewl dida li qada Werxelê bikeve çeperê, bi çekên ferdî çalakî hate lidarxistin û di encamê de 2 dagirker hatin cezakirin, 3 dagirker jî birîndar bûn. Dijmin piştî vê çalakiyê neçar ma ku bi qedemeyekê xwe vekişîne.

**Li herêma Zapê;**

Dagirkeran ji sînorê bakurê Kurdistanê qadên Çiyayê Reş, Ertûş û Şikefta Birîndaran ên herêma Zapê û qada Werxelê jî bi helîkopteran bombe kirin. Bi helîkopterên Skorsky jî hewl dan hêzên xwe li qadê deynin. Hêzên me dest li helîkopteran werdan û gelek helîkopterên dijmin bêyî ku karibin hêzên xwe deynin neçar man vekişin. Li qada Girê Şehîd Şahîn, hêzên me derb li helîkoptereke êrişê xistin, ku hewl dida hêzên xwe li qadê deyne.
Helîkopterên ku xwestin hêzên xwe li qada Kurojahro deynin li destwerdana hêzên me rast hatin û nekarîn hêzên xwe li qadê deynin. Dagirkeran li qada Kurjahro karîbûn carekê hêzên xwe li Girê Şehîd Amargî deynin. Li vê derê jî hêzên me yên YJA Starê hêzên dagirker xistin bin kontrola xwe û bi çekên ferdî li dagirkeran dan. Di encamê de 3 dagirker hatin cezakirin. Li heman cihî bi taktîka sabotajê li dagirkeran hate xistin û 4 dagirker hatin cezakirin. Hêzên me yên YJA Starê di herdu çalakiyan de 7 dagirker ceza kirin.

**Êrişa dagîrker bi destûr Û piştgiriya PDK’ê tê kirin**

Heke PDK’ê destûr û piştgirî neda vê dagirkeriyê artêşa Tirk, wê nekaribû ji pişt ve li gerîlayan bide. Di heman demê de hêzên dewleta Tirk a dagirker ji baregeha Sîrê ya di bin kontrola hêzê n PDK’ê de ya li navçeya Şêladizê bi rê ketine û ji bejahiyê ve, hewl didin li qada Kurojahro bi cih bibin. Hêzên me li van dane û pêşveçûna wan dane sekinandin. Li gorî çavdêriyan, hêzên PDK’ê bi şev ber bi xeta Dêrelo, Şêladizê û Barzanê ketine tevgerê.
Dagirkeran saet di 21.00’an de du caran xwestine bi helîkopteran hêzên xwe deynin qada Kevirêkun a li qada Şikefta Birîndara. Hêzên me dora van dagirkeran girtine û bi xurtî li dagirkeran dane. Bi qasî ku hatiye zelalkirin 5 dagirker hatine cezakirin. Dagirker nekarîne li vir bi cih bibin û xwe vekişandine Kaniya Skorsky. Dagirkeran hewl dane saet di 22.00’an de bi pêş ve biçin, hêzên me dîsa li dagirkeran dane. Bi qasî ku hatiye tespîtkirin 3 dagirker li vir jî hatine cezakirin û 6 dagirker jî birîndar bûne. Ber destê sibehê ve jî li qada Şikefta Birîndara hêzên me li helîkopterên êrişê dane û helîkopter neçar mane, ji qadê vekişin.
Dema 2 helîkopterên êrişê hewl dane



têkevin qada Çemçoyê hêzên me li helîkopteran dane. Helîkoptereke êrişî derbeke giran xwariye û neçar maye ji qadê vekişe.
Di destê sibehê de jî helîkopter ji ser xeta Bamernê, Amêdiyê û Dêrelokê xwestine êrişî Kurojahro bikin, hêzên me li van helîkopteran jî dane. 2 helîkopterên êrişê û helîkoptereke Skorsky neçar mane ji qadê vekişin.
Di 4 rojên dawîn de qadên me 147 caran bi balefirên şer û ji bejahiyê ve jî gelek caran bi obusan hatine bomberdûmankirin. Droneyên bi çek û balefirên şer hê jî li ser qadên me digerin. Hêzên me bi ruhekî fedaî pêla êrişa yekemîn a li hemberî Avaşîn û zapê şikandine. Heta niha 28 dagirker hatine cezakirin, 9 dagirker hatine birîndarkirin û li 2 helîkopterên êrişê hatine xistin.
Berxwedana qehremanî ya hêzên me û şer bi awayekî kûr didome.”

# ‘Ambargoya li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê piştgiriya planên dawleta tirkî ye’

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Mistefa Hemo da zanîn ku ambargoya li ser taxa Şêxmeqsûd-Eşrefiyê plana rejima Surî ya bi dewleta tirkî re ye. Herwiha da xuyakirin ku armanca vê ambargoyê projeya têkbirina jiyana hevbeş û piştgiriya dagîrkeriya dewleta tirkî ye.
Taxa Şêxmeqsûdê li bakur-rojavayê Helebê ye û yek ji wan taxan e ku ji ber êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û hikumeta Şamê gelek êş kişandiye. Herwiha li vê taxê gelek pêkhateyên Ereb, Kurd, Tirkmen û Sûryan hene û bi awayekî komînal xwe bixwe bi rê ve dibin. Jimara şêniyên taxa Şêxmeqsûdê nêzî 200 hezar kesî ye û ev jimar dabeşî 32 hezar malbatî dibe. Herî dawî rêjima Şamê li ser vê taxê ambargo danî û derbaskirina tevayiya pêdiviyên debarê yên jiyanê wek xwarin û dermanan jî qedexe kirin. Kiryarên rêjimê gelek krîz û azaran bi xwe re tîne. Tevî zehmetiyan jî, gelên li vê taxê dijîn li ber xwe didin û serî ji ti kesî re natewînin.
Derheqê ambargoya hikumeta Şamê ya li ser taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) şaxê Helebê, Mistefa Hemo ji me re ev nirxandin kir: “Ambargoya ji aliyê rêjima Şamê ve li ser taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hatî danîn, ne tiştekî nû ye. Gelên van taxan li hemberî terorê û kiryarên rêjimê li ber xwe dane, dikarîbûn rêveberiya xwe ava bikin û taxên xwe bi rê ve bibin. Ji ber wê rêjim û çekdarên girêdayî dagîrkeriya tirkî zextan li welatiyên her du taxan dikin. Li van taxan gel xwe ji şerê di navbera rêjimê û çekdarên girêdayî dagîrkeriya tirkî de dûr xistibû û xwe nespart aliyekî ji wan. Gelên van taxan bi aramî û wekhevî bi hev re dijîn.”
Hemo diyar kir ku hêzên serdest herdem li dijî gelên azadîxwaz kiryarên hovane dikin û axaftina xwe wiha domand: “Hikumeta Şamê jî polîtîkaya dijminane li dijî gel dimeşîne, ew madeyên bingehîn û girîng li ser gel qut dike. Armanca wan şkandina projeya Rêveberiya Xweser e û dûrxistina gel ji rêveberiyê ye. Lê bi saya fikr û felsefeya Neteweya Demokratîk û rêxistibûyîna gel li ser bingekekî exlaqî, planên wan bêencam man û girêdana gel bi rêveberiyê ve bihêztir bû.”
Hemo da zanîn ku hin caran siyaseta hikumeta Şamê û dagîrkeriya tirkî weke hev in, ti cudayî di navbera wan de nîne



û wiha dewamî da axaftina xwe: “Çiqas ku pirsgirêk di navbera hikumeta Şamê û dagîrkeriya tirkî de hebin jî, li ser Kurdan dibin yek û bi hev re planan saz dikin. Praniya welatiyên her du taxan ji bajarê Efrînê ne. Tê xuyakirin ku, ew bi hev re li dijî Kurdan planan saz dikin û girêdaneke xurt di navbera wan de heye. Tevî ku Efrîn bajarekî Sûriyê ye jî, lê hikumeta Şamê li dijî dagîrkirina wê ji aliyê tirkî ve ti bertek nîşan nedan û bêdeng ma. Herdem hikumet behsa sereweriya Sûriyê dike, ka ew serwerî dema ku ew bixwe dihêle ku xaka Sûriyê bê dagîrkirin.”
Hemo bal kişand ser siyaseta Rûsya ya li herêmê û wiha got: “Siyaseta Rûsya li Helebê ne zelal e, Heleb di milê leşkerî de di binê serdestiya Rûsya û Îranê de ye û her du hêz jî di gelek mijaran de li hev nakin. Ambargoya li ser Şêxmeqsûd û Şehba, destê Rûsiya tê de heye û ew vê ambargoyê bi rê ve dibe. Eger Rûsya gavekê bi aliyê çareseriyê ve biavêje, wê rêveberî deh gavan biavêje. Herwiha hikumeta Şamê nikare bê destûra Rûsya tev bigere. Helwesta Rûsya ne zelal e, em dixwazin helwesta xwe eşkere bike.”
Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Mistefa Hemû diyar kir ku tevayiya gelên bakur û rojhilatê Sûriyê li dijî ambargoyê derketin, helwesta xwe nîşan dan û axaftina xwe wiha qedand: “Rêjim dixwaze îradeya gelên herêmê bişkîne, ev gelê ku li hemberî ambargoyê û êrişên terorîstan li ber xwe dan. Em dikarin bêjin ku berxwedana gel li Şêxmeqsûd şerê gelê şoreşgerî ye. Ji gelên di binê sîwana Rêveberiya Xweser de dijîn, tê xwestin ku li dijî ambargoyê derkevin û zextê li rêjîmê bikin da ambargo were rakirin. Gel bi saya projeya Netweya Demokratîk fêrî fedekarî û berxedanê bûye, Kurd, Ereb û Suryan bi hev re têdikoşin. Ev fikir û felsefe wê dewam bike û bibe kilîta çareseriya krîza Sûriyê.”



## Divê PDK mesafeyê bixe navbera xwe û faşîzma tirkî

Zekî BEDRAN

Erdoganê faşîst dîsa Mesrûr Barzanî vexwendiye Tirkiyê. Diyar e ku ev vexwendin û serdan ne ji xêrê re ne. Berî niha Nêçîrvan Barzanî jî vexwendibûn. Pişt re li Antalya hevdîtin kirin. Mesrûr û Nêçîrvan Barzanî ji bo Konferansa Ewlekariyê ya Mûnîhê jî hatibûn vexendin û bi Hulusî Arar re hevdîtin kiribûn. H. Akar diyar kiribû ku hevdîtin baş derbas bûne û li ser PKKê û gerîla gotibû, nêrîna wan yek e. Erdogan jî gotibû, em ji PDKê û Barzaniyan memnûn in.
Rêveberên PKKê û fermandarên gerîla diyar kirin ku PDK nebe amûra dewleta tirkî û şerê ni nava Kurdan de naxwazin. Herwiha gotin, şerê nava Kurdan wê bibe felaketa wan û destketiyên wan tev bikevin xeterê. Rewşenbîr, hunermend, siyasetvan gelek derdorên civakê gazî PDKê kirin û xwestin xwe ji şerê navxweyî dûr bigire. Li hemberî van bangewazî û daxwaziyê ji malbata Barzanî û PDKê daxuyaniyeke erênî nehat. Şandina çekdaran ya ber bi herêmên gerîla ve û amadekariya şer domandin. Li gorî agahiyan û amadekariya tê kirin, xuya dike ku wê dewleta tirkî dest bi êrişeke berfireh bike. Lê encama dixwaze nikare bi dest bixe. Di êrişên par de jî negihat armanca xwe. Ji ber wê ji PDKê dixwaze bi awayekî çalak tevlî şer bibe. Û li gorî agahiyan xuya dike ku wê PDK tevlî şer bibe. Tê gotin ku Barzaniyan soz daye dewleta tirkî ku wê tevlî şer bibe.ş
Dema dewleta tirkî êrişî Sûriyê kir, bi hezaran bi hezaran mirov ji DAIŞ`ê, El Nusra û komên din xistin nava şer. Li Sûriyê bi giranî mirovên ji Ereban kom kirîn xistin nava şer. Li başûrê Kurdistanê jî dixebite Kurdan bide pêş û pêşiya mirina leşkerên xwe bigire. Dixwaze ji her du aliyan jî cenazeyên Kurdan biçin. Dixwaze derbê li hêviya Kurdan ya yekîtiya neteweyî bide.
Sozên dewleta tirkî dayîn Barzaniyan ti qîmetê wan nîne. Heta ku wan li hemberî PKKê bi kar bîne wê PDK`ê û Barzaniyan qebûl bike. Eger PKK û gerîla tasfiye, yan jî lewaz bibin, dewleta tirkî ne PDKê qebûl dike ne jî hesabê wan dike. Wê bêje mûxateba min Bexda ye, hikumeta navendî ye. Bila başûrî referandûma 2017an bînin bîra xwe bes e. Li Sûriyê Kurd û Ereb bi hev dan kuştin û li ser felaketa wan dagîrkeriya xwe rûniştand. Li pey wê ye ku li Başûr jî Kurdan bi hev bide kuştin û serkeftinê bi dest bixe.
Li Tirkiyê aborî roxiyaye. Erdogan di her alî de teşhîr bûye û heta dawiyê ketiye nava sûc bêrêtiyê. Hilbijartin nêzîk dibe. Di rewşeke normal de şansê Erdogan yê serkeftinê nîne. Dixwaze bi bikaranîna PDKê derbê li Kurdan bide wisa biçe hilbijartinê. Li pey wê ye ku li ser xwîn û darîrkirina erdê Kurdan careke din bibe desthilatdar. Serkeftina Erdoran hem ji bo Tirkiyê, hem ji bo Kurdan tê wateya pirbûna felaketê. Divê PDK ji bo berjewendiyên malbata xwe yan jî ji bo partiya xwe Tirkiyê, Rojava û destkeftiyên Kurdan nexwe xeterê. Ev plana bêoxir tiştekî bi PDKê nade qezenckirin. Eger piraniya Kurdan derb li wan bikeve û tasfiye bibin, kesekî ku bi alîkariya PDKê ve biçe namîne.
Qada Erdogan ya tevgerê her ku diçe tengtir dibe. Weke berê nikare nakokiyên navbera Amerîka û Rûsya bi kar bîne. Ji dinyaya Ereban jî hat dûrxistin. Bi Amerîka û Ewropa re bipirsgirêk e. Bi şerê Ukrayna re dîtin ku bê Amerîka û Ewropa nikarin li ser piyan bimînin. Niha li hemberî Amerîka û NATO devê xwe xwar dikin. Êdî nikare bêje, ey Amerîka, ey Ewropa. Berê digotin emê fûzeyên S-400 yên me ji Rûsya girtîn bi kar bînin, niha deng ji wan dernakeve.
Di destê Erdoğan de niha Kurd mane. Çawa be dinya li Kurdan xwedî dernakeve. Eger weke Ukrayna li Kurdan xwedî derketana Erdoganê faşîst nikariya gavekê jî biavêje. Tersê wî her tim desteka Amerîka û NATO distîne. Bi sedê salan e gelê Kurd di binê qirkirinê de ye. Eger desteka Amerîka û NATO nebûya ev polîtîka nedimeşiya. Divê dinyaya Rojava nebe şirîka komkujî û sûcên li hemberî Kurdan. PDK jî divê nebe amûra van lîstikên bixwîn. Divê Ereb, Kurd, Tirk, Asûrî û gelên din li hemberî dagîrker û mêtingeran bi hev re têbikoşin û di daxwaziyên xwe yên demokrasî û azadiyê de bi israr bin.